

„NOW!
Nicht ohne das Wir“

ME EV YEK BI DEST XIST!
2020/2021

„Now! Nicht ohne das Wir“ (Ne bêyê Me)



Em penaberên kêmendami an jî xizmên penaberên kêmendami in. Em pabend in bi tevlîbûna penaberên kêmendami. Armanca me jiyaneke xweser û mirov-vahî ye ji bo me û ji bo penaberên din ên kêmendami.

Em li Almanyayê dijîn. Hinek ji me tenê, hinek jî bi malbatên xwe re dijîn. Pîranî dûr ji penaberên din ên kêmendami dijîn.

Me bi hev re Xwe temsîlkirina „Now! Nicht ohne das Wir“ ava kir.

ME EV YEK BI DEST XIST!

Xwe temsîlkirin: Koma me

Me komek damezrand û em bûn nûnerên xwe. Di vê yekê de Handicap International alîkariya me kir.

Endamên komê

- li hev guhdarî dikin,
- alîkariya hev dikin û
- di siyasetê de û li ba rayedaran û di civakê de berjewendiyên xwe temsîl dikin.

Koma me ji Hezîrana 2020'an û vir ve dicive. Di dawiya sala 2021'an de, me deh caran li ser Înter-netê hevdîtin pêk anîn. Em ji van civînên ser Înter-netê re dibêjin „civînên mehane“. Ji bilî wê jî me sê caran şexsî hev dît, du caran li Berlinê û carekê jî li Kölnê. Hevdîtinên me yên şexsî ew qas xweş in ku tu tişt nikare şûna wan bigire.

Di civînên xwe de,
em ji bo pêşeroja xwe
ramanan berhev dikin û
ji bo koma xwe çalakiyan
plan dikin.

Axaftin li ser dema borî, plankirina pêşerojê

Di civînên xwe yên mehane de em behsa rewşa xwe û pêdiviyên xwe dikin. Em her weha ramanan pêş dixin ka em bi xwe dixwazin çawa maf û berje-wendiyên xwe biparêzin. Handicap International bi me re û piştgiriya me dike. Me niha ji bo koma xwe vîzyon û plansaziyek çalakiyê amade kiriye.

Em gelek behsa çîroka xwe, reva xwe, ezmûnên xwe yên bi tevîbûn û dîrketinê re û xem û dax-wazên xwe yên pêşerojê dikin.



Ev ji bo gelek ji me pir girîng e:

Axaftina li ser xwe me bihêztir dike.

Navekî bi girîngiyeke mezin

Me vê dawiyê nevek li koma xwe kir:

„Now! Nicht Ohne das Wir“

Nav dide xuyakirin ku em bi rêya komê re xwe didin nasandin. Ew ji bo me tê wateya: Civaka me û pab-endbûna me ya ji bo berjewendî û mafên me cesa-retê dide me. Ji bilî wê, ev ji bo xebata me ya xwe temsîlkirinê enerjîyê dide me.

Piştgiriyek baş

Handicap International di rêya me de hertim piştgirî da me û rêberiya me kir. Loma em îro nûneratiya xwe dikin!

Tîma Handicap International

- em anî cem hev,
- çalakiyên me organîze kir û
- di xebata me ye xwe temsîlkirinê de li kêleka me sekinî.

Tîm ji bo koma me her dem xala yekem a têkiliyê bû.

Fêrbûna bi hev re di komê de

Em gelek tiştan li ser mijarên pir girîng fêr bûn.

Kursên perwerdehî

Di sê kursên perwedehiyê de em li ser mafên xwe wek mirovên kêmandam li Almanyayê û li ser sîstema piştevaniya Almanî gelek tişt fêr bûn.

Dewreyên perwedehiya komê

Em beşdarî sê dewreyên perwedehiya komê bûn. Mijarên dewreyan ev bûn:

- hestiyariya strê û traumayê
- jêhatîbûnên navçandî
- karê çavkaniya biyografîk

Em li wê derê tiştek girîng fêr bûn: Ezmûn û jêhatîbûna me çavkaniyek giranbiha ye!

Dewreya çavdêriya komê

Em beşdarî sê dewreyên çavdêriya koma xwe bûn. Li vir em li ser wê yekê nîqaş dikin ka em mîna kom pêwîstiya me çi ye ji bo ku em bikaribin baş bi hev re bixebitin.



ME EV YEK BI DEST XIST!

Çalikiyên me di salên 2020/2021'an de

Berî her tiştî me bi kesên girîng re têkilî danî. Wan kesan di warê alîkariya penaber û kêmendaman de dixebitin.

Ji ber vê yekê me rewşa xwe ji wan re vegot û li ber wan berjewendî û mafên xwe temsîl kir.

Her weha me xwest em bigehîjin wê yekê ku civak, siyaset û rayedaran hesabê ji me re bikin.

Me heta niha li vir çî dikir?

1. Hevdîtin

- Pêkanîna hevdîtinan bi karmendên pîspor û kesên ji siyasetê re

2. Veguhertin

- bi Komîserên Hikûmeta Federal ji bo Penaberan, Koçberî û Entegrasyonê re
- bi xeleka tevlîbûnê ya Regensburgê re
- bi foruma pîspor a koçberî û kêmandamî girêdayî AWO komeleya herêmî ya Berlinê re
- bi projeya „Anders aber gleich – Cûda lê wekhev“ ya girêdayî saziya Wekhevî komeleya herêmî ya Hamburgê
- bi Encûmena Muzîkê ya herêma Nordrhein-Westfalenê re li ser pîrrengiya çandî û şimûlî di muzîkê de



3. Pêşkêşî

- di semînara dîjîtal ya „We are Family“ de
- ji bo Roja Hişyariyê ya komeke xebatê ya xwendekaran li Zanîngeha Ludwig Maximilians li Munihe

4. Çêkirina tora têkilî bi du komeleyên ku ji bo pirrengî û tevlihbûnê hewil didin:

- Sozialhelden (Berlin)
- Menschen treffen Menschen Köln e. V. – Komeleya Mirovan tîm cem hev

5. Perwerdeya pêşketî û dewreyên perwerdehî

- Wek pisporên bi serê xwe ji bo karmendên pispor (bi Handicap International re)
- Beşdarbûn di pênc kursên perwerdeya pêşketî de ji hêla Handicap International ji bo kesên ku di rêxistinên ku bi rev û kêmdamiyê mijûl dibin de, dixebitin

6. Çalakiyên din

- Beşdarbûna semînerên di warê Disability Studies (Lêkolînên Kêmendamiyê) de li Zanîngeha Alice Salomon li Berlînê
- Beşdarbûn di 60-mîn salvegera Saziya Xêrxwaziya Alman ji bo Koran de (Deutsches Blindenhilfswerk)



Beşdarbûna me bû di bûyereke mezin ya siyasî de li înternêta ku 350 kesan tê de beşdar bûn, xaleke girîng bû. Ew li ser vê mijara pir girîng bû „Tevlîbûn: pirsek destûra rûniştinê? Penaberên kêmendamiyê di navbera mafê penaberiyê û mafê beşdarbûnê de“

ME EV YEK BI DEST XIST!

Xwe temsîlkirin di medyayê de

Me bi rojname û televîzyonan re axivî û gotar ni-vîsandin. Me xwest bi rêya vê yekê rewşa penaberên kêmendarm ji bo civakê li Almanyayê vebêjin. Her weha me xwaset em maf û berje-wendiyên xwe biparêzin.

- [Hevpeyvîn bi Aktion Mensch re](#)
- [Rapor di Kobinet de](#)
- [Hevpeyvîn bi kovara Momo re](#)
- [Gotar di Amal Hamburg de](#)
- [Gotar di Abwab de](#)

Me ji bo malpera xwe [Profil](#) nivîsandine. Hin ji me xwe didin nasîn û çîrokên xwe bi kurtî û zelalî vedibêjin.

Em hemî mirovên
bêhempa û bibandor in û
xwedî dîrokek hejîner in.

Bi hev re em bi hêz in!

Me vîdyo û podcastên ku hêsan têne fam kirin, çêkirin. Niha her tişt dikare li ser Înternetê ji hêla gel ve were dîtin

- Vîdyoklîp li ser tevîbûnê: Inklusion bedeutet für mich ...!
- Vîdyoklîp li ser xwe temsîlkirinê: NOW! Nicht Ohne das Wir - Selbstvertretung von Geflüchteten mit Behinderung
- Vîdyoklîp li ser çîroka xwe: Erfahrungsbericht eines Gruppenmitglieds
- Beşa 27 ji The Worldwide Tribe Podcast: From Syria to Germany by Wheelchair, with Nujeen Mustafa and Marwa Mbayed

Em di projeyeke belavokekê de beşdar bûn. Di wê de em hevkariya xwe ya di komê de û projeya Empowerment Now ya ji Handicap International vedibêjin. Belavok bi çend zimanan heye:

- Arabî
- Farsî
- Kurmancî
- Englîzî
- Almanî

ME EV YEK BI DEST XIST!

Me zehmetiyan dedrbas kir

Civînên yekem ên koma me bi pêla yekem a korona di sala 2020'an de hevdem bûn. Ji wê demê ve pevguhertina me û karê me timî hatiye astengkirin.

Di dema pandemîk de, me ji penaberên kêmendarm xwe temsîlkirinê ava kir. Yekî ji me yê din berê nas nedikir. Ew ne hêsan bû!

Lê hemî endam ji komê bawer bûn - hema bêyî têkiliya şexsî. Me li ser Înternetê baştir hev nas kir. Di dawiyê de, me karibû em bi şexsî hev bibînin.

Ji ber vê yekê em di demeke kurt de bûn kom.

Em hemî penaberên kêmendarm in - û zêde xwediye kesayetiyan xwe ne. Berjewendî, hewcedarî û nêrîna me yê cuda hene. Di heman demê de, gelek ezmûn, raman û armancên me yê mîna hev an jî wekhev hene.



Bi vî awayî em ketin ser rê da ku em bibin komek. Me bi hev re gelek nîqaş kir û em bi berdewamî pêşve diçin. Ji xwe em dixwazin di asta ramanên hemî endamên komê de bin.

Di koma me de fikr u ramanên cûda di derbarê çalakiyên me de hene. Ev wek kom û însiyatîfên din e ku ji bo maf û berjewendiyên xwe hewil didin. Ji ber vê yekê me biryar da ku di sala bê de li ser mi-jarên taybet civînên xebatê li dar bixin.

Encam

Em di qonaxa yekem de baş pêş ketine. Ev qonax pir bi heyecan bû! Me berê bi hev re û bi Handicap International re gelek tişt afirandin.

Koma me zindî ye!

Em dikarin bi xwe serbilind bin!

„Now! Nicht ohne das Wir“

Bi saya civînên xebatê,
em dikarin di pêşerojê de
- bi serê xwe û di heman
demê de bi hev re - hîn
baştir berjewendî û mafên
xwe yên şexsî biparêzin.